# EM HEMÎ PÊKVE BO SWÊDÊ

Min bawerî bi hevkariyê heye Tecrûbeya ji pandemiyê û hem jî şerê li Ukraynayê ev e ku Swêd bi hêz e dema ku em bi hev re, wekî welatek, bi qeyranan re rû bi rû dimînin. Di dema pandemiyê de, mirov xwe ji bo parastina tenduristiya kesên din adapte kirin . Îsal hejmareke rekor a swêdiyan serî li hemvärnet'ê (Parastina Navxweyî) dan û îspat kirin ku dixwazin  welatê xwe biparêzin. Û niha em parastina hemî Swêdê nûjen dikin.

Ez dixwazim Swêdê xurt bikin. Bi heman yekitiya di dema pandemiyê de, divê em wan pirsgirêkên civakî ku welatê me qels dikin, çareser bikin. Sûcên giran û cudakarî zirarê didin hemî civaka me. Girêdayîbûna me ya bi sotemeniyên fosîlî, hem ji bo jîngehê hem jî ji bo ewlehiya me xeteriyek e.
Û pereyên bacê yên ku divê biçin dibistanên swêdî û lênêrîna kal û pîran, ji hêla sermayedarên veberhênanê ve wekî qezencê têne birin.

Divê ne wisa be. Em dixwazin vê biguherin.

**Em dixwazin:**

- Ji bo şikandina krîmînalîteyê û şikandina cudakariyê her kevirekî bizivirînin.
- Peydakirina karên nû li Swêdê bi guherîna toreya parastina jîngehê.
- Kontrola demokratîk a li ser refaha civakê paş de vegerînin.

Ji bo bihêzkirina welatê me çi pêwîst be ez ê bikim.
Ji ber ku  **Swêda me dikare yê çêtir bike.**

Magdalena Andersson

Lättläst svenska, Soomaali,عربي , English, Español, Suomen kieli, Meänkieli, دری, Davvisámegiella, Deutsch, Srpski, Hrvatski, Bosanski, فارسی , Kurmancî, سۆرانی, Polski, Türk

Bibe endam îro! Bi karanî-na sepana Swish koda QR-ê bişopînin

Socialdemokraterna


Kurmanji
Socialdemokraterna
MESWÊDA DIKARE
YÊ ÇÊTIR BIKE.

# TÊKOŞÎN LI HEVBERÎ KRÎMÎNALÎTEYÊ BIKE Û CUDAKARIYÊ BIŞKÎNE

Têkoşîna civakê ya li dijî krîmînalîteyê divê bê rehm be. Divê hemî cihên niştecihbûnê bi ewle bin û şert û mercên jiyanê yên li herêmên xizan bên başkirin. Her kesê ku dikare bixebite divê bixebite.

**Em dixwazin:**

**Bêhtir cezayên giran bidin û darizandina dadmendiyê berfireh bikin.** Divê polîs, girtîgeh, dozger û dadgeh ji bo têkoşîna li dijî sûcan xebatkar û amûrên pêwîst hebin. Divê cezayên sûcên çeteyan bên girankirin.

**Tevlîbûna nû ya li nav çeteyan rawestînin.** Dema ku ciwan di bin xetera sûcê de bin divê civak bi lez û bez mudaxale bike. Divê hemû ciwan biçin dibistanên baş  û bibînin ku  bavên wan diçin ser kar. Swêd bi hêztir dibe dema ku her kes beşdar bibe û tevkariya civakê bike.

Şikandina cudakariyê Pêdivî ye ku her kes heman merc û derfetên zelal bi cîh bîne da ku bikaribe bi karê xwe debara xwe bike. Bêyî ku ciwan li ku mezin bin derfetên perwerdehiya baş, dema vala ya bi wate, karê yekem û xanî dê zêdetir bin.



# KONTROLA DEMOKRATÎKÎ A LI SER REFAHETÊ PAŞ DE VEGERÎNIN

Li dibistanê, li lênêrîna tenduristiya û kal û pîran divê rêk û pêkî hebe. Divê karmend xwedî şert û mercên baş ên xebatê bin û gelê swêdîbikaribe refaha ku tê de ye û bi pereyê baca xwe ku heqê refahê dide, ew kontrol bike.

**Em dixwazin:**

Dest ji talankirina refahê berdin Divê pereyê baca gelê swêdî ji bo refahê were bikarhanîn, ne ku wekî qezencê were birin. Refaha civakê divê li gorî pêwîstiyên mirovan were rêvebirin, ne bo pêwîstiyên bazarê. Divê dibistanên swêdî pêşî li zanîna zarokan bihizirin, ne li berjewendiyên xwedankar..

Bo xebatkarên refahê şert û mercên baş dabîn bikin. Divê her kesê ku li dibistanê, lênêrîna nexweşan û li hemşîretiyê dixebitin, şert û mercên xebatê yên baş, mûçeyên baş û teqawidiyek ku mirov pê bikare bijî bo wan hebin.

Kalîteya refaha civakê bilind bikin. Li dibistanê, li lênêrîna nexweşiyê û hemşîretiyê divê bêhtir xebatkar hebin, da ku xwendekar hîn bêhtir fêr bibin, sirayên lênêrînê kurtir bibin û ewlehiya kal û pîran zêde bibe.

# LEZ KE GUHERÎNA TOREYA PARASTINA BO PEYDAKIRINA KARÊN BÊHTIR

Divê gelê swêdî ji bo ajotina otomobîlê yan germkirina xaniyan ne girêdayê dewletên xapînok be. Dema ku em pîşesaziya xwe û hilberîna xwe ya enerjiyê ji nû ve ava dikin, em ewlehiya Swêdê zêde dikin, li seranserê welêt karên nû ava dikin û gemariya avhewa kêm dikin.

**Em dixwazin:**

Di teknolojiya kesk de veberhênan bikin û girêdayîbûna me ya bo neftê bişkînin. Veberhênana bo avhewayê, azadiya welatê me bêhtir dike, li seranserê welêt karan diafirîne û gazên gemar ên li nav avhewa kêm dike.

Piştgiriya endustriya swêdî. Endustriya swêdî dê di warê guhertin, afirandina hilberîn û xizmetên nû û her bi vî rengî di cîhanê de yê herî çêtir be.

Misogerkirina şert û mercên bidad Karên kesk ên pêşerojê divê xwedî şert û mercên baş, mûçeyên swêdî û peymanên kolektîf bin. Divê derfetên nûkirinê baş hebin û di bûyera nexweşî yan bêkariyê de divê her kes xwedan ewlehiya aborî be. Kesê li hemî jiyana xwe xebitiye, divê bikaribe bi mûçeya teqawidiya xwe bijî. Pirs pirsa rêzgirtinê ye.